

zarokno, bi zimanê xwe bixwînin û binivîsin!

# KULÎLK

kurdiska elevernas barntidning


KOVARA ZAROKÊN KURD YÊN ŞAGIRT



Hejmar: 39



*newroz*



*pirozbe*

**HÊJE MÊJE  
EMÊ NUHA ÇEND  
ÇÎROK Û MESELÊN XWE  
JI WE RE BÊJIN**


**Kulîlk**

**Sal: 1989**

# **Çîrok: DÎK û KÎSO**

**Wêne : Pîro**

**Rojekê ji rojan dîk û kîsok li hevdû rastên. her du dibin destbirakê hev û dixwazin bibin şîrîkê hev yê cot. Her du destbirak halet û tov ji xwe re dîkirin û berê xwe didin ser cot.**



**Dîk bênevsîya dike û dikeve ser tov, tov dixwe. Heta Kîso pê dihesê, Dîk nîvê tov dixwe. Kîso gelekî bîhna wî teng dibe, radibe misasekê li Dîk dixê. Bi lêxistina misasê ba ji ber Dîk dihere. Dîk gelekî li ber xwe dikeve û pencakî li cavê Kîso dide, cavekî Kîso dirjîne.**

**Dikin û nakin dehwa wan safî nabe. Radi-bin deherin cem bûm şerîetê.**



**Kîso gote Bûm: Ey Bûm.**

**Ewî got: Ew navê min.**

**Kîso got: Li ser tûm.**

**Ewî got: Ew paytextê min.**

**Kîso got: Em hatine cem te şerîetê.**

**Ewî got: Ew karê min û bavê min.**

**Kîso got: Ez û Dîk em bûne şîrêkên hev bi cot.**

**Bûm got: We aqûbetî kir.**

**Kîso got: Dîk nîvê tov xwar.**

**Ewî got: Wî bênefsî kir.**

**Kîso got: Min misasek lê da.**

**Ewî got: Te neheqî kir.**

**Kîso got: Ba ji ber çû.**

**Ewî got: Wî bêhinfirehî kir.**

**Kîso got: Wî pencak li çavê min da; çavê min peqand.**


**Ewî got: Wî jî bêhemdî kir.**

**Bûm rabû ser xwe û got:**

**-Bi eniya min, min xebera xwe got; Dîk û Kîso nabin şîrêkên hev bi cot.**

**( Ji Ronahî, s. 70 )**





# QUNCIKA TARÎXA EDEBYETA KURDÎ



## ELÎ TEREMOXÎ

Alêksandir Jabada di kitêba xwe de, li ser şayir, ulumdar û zanyarên kurda hinek malûmat nivîsiye. Di derheqa Elî Teremoxî de Ewî weha nivîsiye: "Elî Teremoxî ji gundê Teremoxî ye. Merivekî gelek zana bû, gelek ulum zanîbû ye. Zimanê erebî, farisî, tirkî û kurdî rind zanîbûye. Gelek gerîyaye; çûye Bexdayê, Musulê, Bahdînanê û Soran. Bi zimanê kurmancî "Qewlê Yekane", "Kurêd Weten", "Morîya Yaqut", "Jiyana heqîqet xewn e "û Serf û neha Kurmancî nivîsiye."

Heta niha destnivîsarên wan nivîsarên Elî Teremoxî neketine ber destê zanyaran, ku mijûlî lêgerîna wan bibin. Lê divêt bêjim, ku her bi tenê destnivîsarên Elî Teremoxî yên "Rêzimana kurdî û erebî" aşîkarin. Ew niha li kitêbxana Saltikor-Şedrindanin li Lenîngradê ye. Di derheqa wan, Marûf Xezandar di pêşgotina xwe ya "Destûra zimanê erebî bi kurdî" da gilî dîke û dinivîse, ku "Elî Teremoxî li sedey şanzdehefdeh damî zayîn jîye û sereta destûre "Sarfê zimanê erebî bi zimanê kurdî bona qutaban" nivîsiye" (ruê 22)

(Ji Tarîxa Edebyeta Kurdî 1, Prof. Qenatê Kurdo )

**PÊNC TIŞTÊN NE WEK HEV BIBÎNIN!**



# MISABEQA (HEMBERÎ YA) ZAROK Û CIWANÊN KURD LI SWÊDÊ

Li paytextê Swêdê Stockholmê, kovara Federasyona Komelên Kurdîstanê BERBANG, bû du sal misabeqa helbest, çîrok, resim, stran û govendê di nav zarok û ciwanên kurda li dar dixîne. Bimunasebeta vê misabeqê, di 29 ê çile de şevê hat çêkirin. Zarok û ciwanên xelat girtibûn, xelatên xwe girtin. Stran, helbest û govendên hate pêşkêşkirin, dilê temaşevanan geş kir.

Di beşê helbestan de Peyman Amedî (17 salî) bi helbesta xwe ya navê wê "Welatê min", bû yekemîn. Îsmail Amedî (15 salê, bi "Ey dijmin") bû duyemîn û Azad Baran (12 salî, bi "Wext") bû sêyemîn.

Di beşê çîrokan de Cewdet Amedî (14), bi çîroka xwe ya navê wê "Ew roj ji bîra min naçit" bû yekemîn. Zozan Arslan (13) bû duyemîn û Esat Aydın (16) jî bû sêyemîn.

Beşê resiman, di sê grûban de pêk hat.

Di grûba yekem (4-6 salî) de, Geşa Mahmûd bû yekemîn. Sîpan Bal û Jiyan Do-



## HELBESTA YEKEM

### **WELATÊ MIN**

Welatê min her yê xweş e  
 Li bahara pir yê geş e  
 Kew dixwînin ber kanîya  
 Çiyadiden bi wî rewş e

Welatê min şox û şeng e  
 Dîmenê wî hemî reng e  
 Çemêt avê lê diherikin  
 Li cîhanê bi nab û deng e

Welat min birîndar e  
 Rêka pîyade û siwar e  
 (Hivîya jar û hejar e)  
 Nale nala wî ji dûr têt  
 Gazî diket bi hewar e

Welatê min hem zozan e  
 Hem kanîye û hem bostan e  
 Çîyayêd wî sorîn ji xwîn  
 Navê wî jî Kurdîstan e.

**Peyman Amedî (17 salî)**

gan bû duyemîn û Rojîn Ozdemir jî bû sêyemîn.

Di grûba duyem (7-10 salî) de, Zelal Bal bû yekemîn. Dilovan Xalit bû duyemîn û Evîn ozalp Kasret bûn sêyemîn.

Di grûba sêyem (11-16 salî) de, Ozgur Gezgîn bû yekemîn. Evîndar Dalaba bû duyemîn û Emîne Onatlî jî bû sêyemîn.

Di Koroyê de, koma Paytext xelata yekemîn, koma Zarokxana Kurdî xelata duyemîn û koma Zêrevan xelata sêyemîn girtin.

Di stranan û grûba yekem de, Hêlîn (11 salî) bû yekemîn. Dilniya (10 salî) bû duyemîn û Evîn (14 salî) bû sêyemîn.

Di stranan û grûba duyem de, Govend (5 salî) xelata yekemîn, Rojîn (6 salî) xelata duyemîn û Lana (6 salî) xelata sêyemîn girtin.

Bê gûman kar û barê wilo gelek giranbihan in. Hevîya me ya sibê, zaro û ciwanên îro nin. Em hêvîdarin, ku ewê misabeqên weha her berdewam bin.

Em di vê hejmarê de, çend berhemên xelat girtine pêşkêşî we dikin. Di hejmarên me yê bê jî, emê wan berheman bixwazin biweşînin.

## ÇÎROKA YEKEM

### **EW ROJ JI BÎRA MIN NAÇÛT**

Piştî sala 1975 an dema şoreşa Kurdistanê şkestî mala me jî wekî gelek malêt kurda hatine îranê û bûne penahêde.

Me li gundekî Kurdistanana îranê ku di kevîte nêzîk Kurdistanana Tirkîye xanîyek bo xo ava kir. Xanîyê me li ser lêva çemekî bû li bin çîyayekî bilind. Li sala 1979 an rijêma şahê ket û kurd azad bûn û Kurdistan kete destê pêşmergan.

Piştî salekê pasdaran hêriş îna ser Kurdistanê û dîsa halê kurdan perîşan bû, pasdaran gelek kurd kujtin û gelek gundên Kurdistanê ketine destê wan, gundê me jî yek ji wan bû.

Havîna sala 1985 an êvar bû me mêhvan hebûn, mêhvanan ça vedixwar dengê maşenekê ber dergehî hat em çûyne derve me dît pênc pasdarên bi tiveng yê li ber dergehî û pisyara babê min kirin.

Babê min hate ber dergehî û pasdaran ew girt û birine zîndanê. Min hîngê nedizanî çiyê û ka ber çî babê min girtin lê piştî babê min ji zêndanî derketî min zanî zîndan ew cihe yê kû mirovan têda eşkence diken û bi sêdarê vedikin.

Her wesa jî min zanî kû babe min ji ber kurdayetiyê hatibû girtin.

**Cewdet Amedê (14 salî)**

# VAN HEJMARAN YEKO YEKO BIGHININ HEV





## TAHSÎLDAR Û KER


Rojekê tahsîldarek dihere gundekî berîyê. Wek her gav, gundî her yek bi alîkî direvin, lingên gundîyan li hevdû digere. Ji ber kû di wê demê de qaçora serê terş û heywanan hebû. Gundîyên feqîr bi zor xwe xwedî dikirin û ew qaçora ji wan re gelekî giran dihat.

Wek her car gundîyan terş û heywanên xwe bi lez ji nav gund derdixistin. Ew li paş girik û di çem de vedişartin.

Lê mixabin vê carê xeber dereng dighêje Çelo. Ji bo wê jî nagihê, ku Çelo kerê xwe ji nav gund derxîne.

Çelo ji bo qaçora kerê nede, radibe dihere êxur. Kerê ji êxur derdixîne û tîne alîyê malê. Her çar lingên kerê bi verîsekî girê dide. Doşekê davê erdê, kerê dixê nav û lihêfekê davê ser.

Tahsîldar mal bi mal digere. Çi heywanên kû dibîne, qaçora wan bi zor ji xwedîyê wan



distîne.

Dor tê ser mala Çelo. Çelo dikeve tev, lê naxwaze tirsaxwe bide xwanêkirin.

Tahsîldar dikeve hewşê, li axur û xanîkê êgir digere, tiştê nabîne. Tahsîldar derbasî alî malê dibe, li we de re jî tu heywana nabîne. Gava ewê ji malê derkeve, lê hayî dibe, ku kesek di nav nivîna deye. Tahsîldar dizane, ku însanek bi roj di nav nivîna debe, tê wê manê, ku ew kes nexweş e. Ji bo wê, tahsîldar ji Çelo dipirse:

-Xîre, ew kî ye nexweş e?

Çelo:

-Heyran, weleh ew bavê min e.


Tahsîldar dihere ser nivînê, dixwaze li halê yê nexweş binere û dibê:

-Hela ez li halê apê xwe binerim, bê çawa ye.

Gava Tahsîldar lihêfê radike, dibîne ku kerêk di nav nivîna de ye. Dibe tik tik ka Tahsîldar, dizivire ser Çelo û dibê:

-Heyran, ji bo ev camêra bû bavê te û apê min, bi xwedê ez jî qaçora vî ji te nastînim.

**Bavê Hêvî**



## ÇAV

### 38-51 ÇAV

- 38- bîr  
 39- palikê çav ê jorîn  
 40- palikê çav ê jêrîn  
 41- bijang  
 42- reşika çav, iris  
 43- bîbik  
 44- masûlkeyên çav  
 45- gûza çav  
 46- spika çav  
 47- perdeya çav, gilênc  
 48- nîske  
 49- tora çav, retina  
 50- piniya kor  
 51- reha bînahiyê

### GÖZ

- kaş  
 üst göz kapağı  
 alt göz kapağı  
 kirpik  
 iris  
 göz bebeği  
 göz kasları  
 göz yuvarlağı,  
 göz küresi  
 göz akı  
 saydam tabaka  
 göz merceği  
 ağ tabaka  
 kör nokta  
 görme siniri

### ŒIL

- sourcil  
 paupière supérieure  
 paupière inférieure  
 cil  
 iris  
 pupille  
 muscles oculo-  
 moteur  
 globe oculaire  
 corps vitré  
 cornée  
 cristallin  
 rétine  
 papille  
 nerf optique

### EYE

- eyebrow  
 upper eyelid  
 lower eyelid  
 eyelash  
 iris  
 pupil  
 ocular muscles  
 eyeball  
 vitrous body  
 cornea  
 lens  
 retina  
 blind spot  
 optic nerve

(Ji Kurmancî - 3)

# QUNCIKA BAJARÊN KURDISTANÊ

## BEDLÎS -2-

Tûtina Bedlîsê bi nav û denge. Tûtin li qe za Mûtkî û li derdora Bedlîsê tê çandin.


Fêkî li derdora Bedlîsê zêde ye. Bi piranî tû, sêv, hirmî, mişmiş û findiq hene. Hirmîyê Exlatê gelekî bi nav û deng e.

Xwedîkirina heywana jî, bo rûniştevanê Bedlîsê cîhekî taybetî digre. Ji %90 yên rûniştevanan ya heywana xwedî dikin, ya jî dikirin û difroşin. Bi piranî gamêş, mîh û bizin tên xwedîkirin.

Mêşê hingiv jî li vê herêmê gelek in. Hingivê Bedlîsê gelek xweş e û bi nav û deng e.

Li gorî derdora xwe Bedlîs, ji alî daristana jî dewlemend e. Nivê axa vê herêmê daristan e. Bi piranî darên mazî û sipîndar henin.

**ENDUSTRÎ:** Li derdora Bedlîsê, tu karxanên mezin tunenin. Li bajêr bi xwe, karxanek tûtînê ya Tekelê heye. Van salên talî de, kar-



xanek cixara hate çêkirin. Xwedîyên vê karxanê şîrketên Emerîkî û çend dewlemendên Tirkan in. Lê karxane hîn bi tamamî kar nake.

Rûneştevanên Bedlîsê aborîya xwe bi piranî ji dan û stendina heywanan derbas dikin. Ji dervî tîcareta heywanên sax, rûn, hirî, çerm û hingiv jî tên firotin.


**RÛNIŞTEVAN:** Hejmara rûniştevanên vê herêmê 185 000 in. Serê km yê 22 mirov dikeve.

Hejmaran mirovên bikanibin bixwînin û binivîsin pir kêmin. Li bajêr%75, lê li qezaya Xizanê bes %10 kes xwendin û nivîsandina wan heye. Dibistanên bilind tûnenin. Gelek gund bê dibistan in.

**RÊ:** Bedlîs, derdora gola Wanê û Diyarbekirê bi hev girêdide. Rêya tirênê ya ji Stembolê tê Wanê, li Tatwanê diqede. Ji heftê çar rojan tirên û sê rojan jî ekispres tê Tetwanê. Rêyên kû ji bajêr diçe bajarên din, baş in. Rêyê gunda bi piranî kêmin. Rêyên henin jî ne qîrkirînin.

Li ser gola Wanê jî gemî kar dikin. Gemî di navbêna Wanê û Tatwanê de kardikin. Belafirgeh li Bedlîsê tune ye.

**TURÎZM:** Berhemên herî kevn keleha Bedlîsê ye. Keleh di nav bajêr û ji alî serleşkerê Îskender ve hatîye avakirin. Di nava kelehê



medresa İhsani



de dikan, hemam û du birkên avê henin.

Bê vê kelehê di nava bajêr de sê mizgeftên kevn henin. Di nav wana mizgefta Şerefiyê ji alî Şerefxan de hatiye avakirin. Bilî van mizgeftan, dibistana Şerefxan jî di sala 1590 de ji alî Şerefxan de hatiye avakirin.

Cîhê kû bi piranî turîsta dikjîne, çîyayê Nemrûd û gola li ser vî çîyayî ye. Çîyayê Nemrûd li bakurê Tatwanê û 15 km dûrî Tatwanê ye.

Avgerm li vê derdorê pir in. Li bajarê bedlîsê avgerma Azapaxa, li nêzî pira Şêmûnê avgerma Şêmûnê, bi nav û deng in. Ev avgermanan ji bo nexweşiyên çerm, ba, guh û êşa diranan gelek baş in.

FOLKLOR: Cilên zilama bi piranî şalwerên ji hirî û cepken li ser henin. Serpûşê jî li serê xwe girêdidin.

Di govendê vir de, bi piranî mêr û jin bi hev re dileyzin. Lîska Lorkê ya herî pir tê lîstin. Bê Lorkê, Maralcan û Temiraxa jî pir tê lîstin.

Xwarina herî xweş Buryan (kebabên tenûrê) û Kutilkê Bedlîsê ye. Çoregên Mûtkî, çortan û turşiyên Exlatê jî dibê mirov ji bîrnekin.

\*\*\*\*\*

## PÊZANÎN

1- Zevîkî min heye,  
Toxim nareşînim şîn tê,  
Av nadim dighêje,  
Peretî didrûm, Berê wê kêr nayê.  
Ew çiyê ?

Bersîv:

2- Qutîka Silêmanî,  
Serê heft rîya danî,  
Pêştirî xwedê kes pê nizanî.  
Ew çiyê ?

Bersîv:

3-Almast çû mala mîra,  
Pey bû şeqe şeqê tîra.  
Ew çiyê ?

Bersîv:

4-Can bêcanê sîyar bû,  
Can bêcanê tev bêîmanê sîyar bûn.  
Ew çiyê ?


Bersîv:

# QUNCIKA MATAMATÏKË

|   |   |   |   |
|---|---|---|---|
| $\begin{array}{r} / \\ 56 \\ + 24 \\ \hline 80 \end{array}$ | $\begin{array}{r} 32 \\ + 26 \\ \hline \end{array}$ | $\begin{array}{r} 56 \\ + 27 \\ \hline \end{array}$ | $\begin{array}{r} 35 \\ + 42 \\ \hline \end{array}$ |
| .....   | .....   | .....   | .....   |

|   |   |   |   |
|---|---|---|---|
| $\begin{array}{r} 54 \\ + 16 \\ \hline \end{array}$ | $\begin{array}{r} 38 \\ + 20 \\ \hline \end{array}$ | $\begin{array}{r} 59 \\ + 36 \\ \hline \end{array}$ | $\begin{array}{r} 43 \\ + 34 \\ \hline \end{array}$ |
| .....   | .....   | .....   | .....   |

|   |   |   |   |
|---|---|---|---|
| $\begin{array}{r} 17 \\ + 39 \\ \hline \end{array}$ | $\begin{array}{r} 46 \\ + 42 \\ \hline \end{array}$ | $\begin{array}{r} 81 \\ + 19 \\ \hline \end{array}$ | $\begin{array}{r} 13 \\ + 48 \\ \hline \end{array}$ |
| .....   | .....   | .....   | .....   |



## **KURDISTAN ŞÊRÎN E.**


**Bûye buhar gul û gîha  
Bû barîna berx û mîha  
Kew dixwînin li ser çîya  
Kurdîstana min şîrîn e**

**Av herikî ji zozana  
Şahî ket nava kolana  
Bo karker û xwendevana  
Kurdîstana min şêrîne**

**Bi xêr hat Newroz û dîlan  
Keç û xortên mey nû gîhan  
Neman lê nalîn û giryan  
Kurdîstana min şêrîne**

**Kurdistan warê bavpîra  
Bo rencbera û feqîra  
Heta ji bo kal û pîra  
Kurdîstana min şêrîne**

**Apê Xerîbo**



## KEVANÎYA BÎRSAR

Carekê gundîyak bû mêvanê malekê. Kevanîya malê şorbe çêkiribû. Şorbe anî danî ber mêvan, lê kevçî ji bîr kir.

Mêvan dinhere kevanî serwext nabe, ji kevanîyê dibê:

-Xuşkê, xuşkê ka tu ji kerema xwe re kêrê nayîne ?

Kevanî dibê:

-Mêvanê ezîz, ma tê bi kêrê çi bike ?

Mêvan dibê:

-Ezê guhê xwe jêkim, bikim kevçî û şorbê pê bixwum. . .

KEÇA "EFENDÎ"

# XAÇEPIRS



1



1  
2→

3→


4→

5→



5

6→




3


7→



7



4



6

**BERSÎVA PÊZANÎNAN**

**1- Di mêzînê nasekine  
Li bazarê nayê firotin  
Lê gelekî şêrîn e.  
Ew çiyê ?  
Bersiv: Xew**






**2- Tişkî min heyê  
Dirêj, dirêj  
Kevan dirêj  
Ew çiyê ?  
Bersiv: Merivê razayî, çaxa lingê  
xwe kevan dike.**

**3- Hesin, bizin  
Gayê mezin  
Tev dilîzin  
Tev dibezin  
Ew çiyê ?  
Bersiv: Sol û meriv**

**4- Bênder ji goşt  
Cercer ji hesin  
Avê bidê bajo  
Ew çiyê ?  
Bersiv: Rû û gûzan**



# BERSÎVA XAÇEPIRSAN



KEREKÎ ME HEBÛ  
Û KUNDIREKÎ ME  
KERÊ ME  
KUNDIRÊ ME KOT KOT  
  
ME JÎ ÇÎROK  
Û MESELÊN XWE  
YÊN VÊ HEJMARÊ  
JI WE RE GOT

Kulîlk





YAN

# KURDISTAN

YAN NEMAN !

UTGIVARE

KURDISTANS ARBETAR-KULTUR FÖRENING

WEŞANA KOÇ - KAK

KOMELA ÇANDA KARKERÊN KURDISTANÊ

ADRESS - NAVNÎŞAN

BOX 7031

163 07 SPANCA - STOCKHOLM

SWEDEN

POSTGIRONR. 98 66 50-0

PRIS : 10:- skr  
BIHA